




### Efrîn di bin dagîrkeriyê de (188):

Gundê "Naza" guhertineke demografi fere, girtinine bêsucane û lîstak bi navên girtiyên "Me'imila", qutkirina daristanên xwezayî, belavkirina tevliheviyê li Navça Şiyê



1- جاسر حلقه ابراهيم 67	65- جاسر حلقه ابراهيم
2- جاسر حلقه ابراهيم 68	53- جاسر حلقه ابراهيم
3- جاسر حلقه ابراهيم 69	49- جاسر حلقه ابراهيم
4- جاسر حلقه ابراهيم 70	58- جاسر حلقه ابراهيم
5- جاسر حلقه ابراهيم 71	58- جاسر حلقه ابراهيم
6- جاسر حلقه ابراهيم 72	40- جاسر حلقه ابراهيم
7- جاسر حلقه ابراهيم 73	61- جاسر حلقه ابراهيم
8- جاسر حلقه ابراهيم 74	58- جاسر حلقه ابراهيم
9- جاسر حلقه ابراهيم 75	41- جاسر حلقه ابراهيم
10- جاسر حلقه ابراهيم 76	35- جاسر حلقه ابراهيم
11- جاسر حلقه ابراهيم 77	60- جاسر حلقه ابراهيم
12- جاسر حلقه ابراهيم 78	40- جاسر حلقه ابراهيم
13- جاسر حلقه ابراهيم 79	35- جاسر حلقه ابراهيم
14- جاسر حلقه ابراهيم 80	50- جاسر حلقه ابراهيم
15- جاسر حلقه ابراهيم 81	40- جاسر حلقه ابراهيم
16- جاسر حلقه ابراهيم 82	55- جاسر حلقه ابراهيم
17- جاسر حلقه ابراهيم 83	58- جاسر حلقه ابراهيم
18- جاسر حلقه ابراهيم 84	43- جاسر حلقه ابراهيم
19- جاسر حلقه ابراهيم 85	48- جاسر حلقه ابراهيم
20- جاسر حلقه ابراهيم 86	63- جاسر حلقه ابراهيم
21- جاسر حلقه ابراهيم 87	68- جاسر حلقه ابراهيم
22- جاسر حلقه ابراهيم 88	53- جاسر حلقه ابراهيم
23- جاسر حلقه ابراهيم 89	40- جاسر حلقه ابراهيم
24- جاسر حلقه ابراهيم 90	35- جاسر حلقه ابراهيم
25- جاسر حلقه ابراهيم 91	30- جاسر حلقه ابراهيم
26- جاسر حلقه ابراهيم 92	25- جاسر حلقه ابراهيم
27- جاسر حلقه ابراهيم 93	20- جاسر حلقه ابراهيم
28- جاسر حلقه ابراهيم 94	15- جاسر حلقه ابراهيم
29- جاسر حلقه ابراهيم 95	10- جاسر حلقه ابراهيم
30- جاسر حلقه ابراهيم 96	5- جاسر حلقه ابراهيم
31- جاسر حلقه ابراهيم 97	0- جاسر حلقه ابراهيم
32- جاسر حلقه ابراهيم 98	
33- جاسر حلقه ابراهيم 99	
34- جاسر حلقه ابراهيم 100	



غابة طبيعية، شمال قرية "نازا" - ماينا/معيطلي، تموز ٢٠١٧  
غابة طبيعية، غرب قرية "رمضان" - جنديرس، اب ٢٠٢٠  
غابة طبيعية، شمال قرية "نازا" - ماينا/معيطلي، تموز ٢٠١٧  
غابة طبيعية، شمال قرية "نازا" - ماينا/معيطلي، تموز ٢٠٢٠

**B**i kuştina anîndeyê Hemwî "Ebid Elrezaq El'ubêd" re, "Ewlegehiya Feyleq Elşam" û hepsa wê ya taybet li Gundê "Îska" - Şêrewa riswa bûn, ji ber wê serkêşiya "Feyleqê" neçar bû ku wê ewlehiyê û hepsê ji holê rake û hepisciyan jî ji wir veguhêse. Lê hîn bidehan ji hepsên taybet û diziyane yê Milîseyên "Artêşa Niştîmanî" li herêmê hene, ma çarenûsa yê tê de işkencekirî û zorane veşartî çi ye? Di bin dilovaniya kê de

wê bimînin? Û ta kengî bêdengiya Civaka Navdewletî li hember Dagîrkeriya Turkiyê, nandozên wê û rewşên serwerkirî yê herî pîs wê berdewam bike?

### **Vaye hin bînpêkirin û tewanên ku hatine kirin:**

#### **= G. "Naza":**

Bi Navça Şera ve girêdayî ye, bi /19/K.M an ji navenda wê dûr e, ji dora /165/malan pêkhatî ye, dora/850/nişte ji Nişteciyan Kurd ên resen tê de bûn, di dema şerê bi ser herêmê de hemî penber bûn, jê /57malbat=170nişte/vegerîn, û dora /110malbat= 650nişte/ ji anîndeyan tê de hatin niştেকirin.

Bi sedema topebaranê zîyan bi piçekî gihîştê /4/malan. Milîseyên "Feyleq Elşam" - a ku ta navîna Gulana 2018an Z nehîştîye xelk vegere ciyên xwe - gund desteser dikin, dest danîn ser dora /110/malan, û tevahiya kelûpelên malên gund -ji bilî dudîyan- dizîn, mîna xwarinveşwarin, raxistok, alav û amûrên elektirîkê, firaxên baqirî û hin tiştên din; Û herweha jî dizîna du makînan (pîkaba "Mecîd Şêxo", teksiya "Xelîl Ehmed"), du girovên zayenda elektirîkê (ampêr) ên "Ehmed Îbrahîm" û "Mihemed Hemîd Şêxo", tevaya acetên guvêşgeha zeytûna ya "Ehmed Osman" (a ku paşê dest danîne ser avahiya wê û kirine axur ji çêlan re), jimarokên ava vexwarinê, guheztok(tirans) û keblên toreya elektirîkê ya giştî û hemî stûnên wê yê textî, keblên xeta voltaca bilind, keblên telîfûna zemînî ya ku ji Navenda Meydankê hatiye kişandin û li nav gund gerandî, û girova zayenda elektirîkê ya stasyûna kişandina ava vexwarinê ya taybet bi gundên "Naza, Meydankê, Dêrwîş û Alciya", ya ku paşê ji aliyê rêxistineke fîxaniyê ve hatiye amedekirin û bikaranîn.

Wan dest danîn ser avahiya tîmargeha mirîşkan (ferûc) û ji çêlan re kirin stewil, û dora/700/darên zeytûnê yê xwedî ne li gund, weha jî 50% vêrgî li ser werzên(mûsim)zeytûna yê ku xwedî li derveyî gund û 10% jî li ser ên hene ferz dikin.

Û ji bo êzingirin û bazirganiyê, wan bisedan darên zeytûnê û piraniya darên Zaretgeha "Takî Ta", bi rengekî hovane û bêwijdan qut kirin.

Weha jî xelkê ku li gund mane rastî rengereng cûreyên bînpêkirinan hatin, mîna revandin û girtinên nesûcane, îşkencekirin, rûmetdaxistin û peresitandin; Û bidehan ji wan bi demên têvel hatin girtin digel ferzkrina vêrgî û sezayên diravî, mîna xort"Hisên Xelîl Îbrahîm/22/sal" (yê ku ji Avrêla 2018an ve hatiye girtin, û bêtirî sê sal û nîvan zorane hatiye veşartin) ta niha di Hepsa "Maratê" de - Efrîn bendkirî ye, û dê û bavê wî -yên temenmezin- ji bo berdana wî nikanin sezayên diravî bidin û ne jî kanin parêzeran jê re bigrin.

#### **= Girtinê bêsûcane:**

#### **Destlatên dagîrker ev girtin:**

- Li 7.2.2022an Z, ev hemwelatî "Şiyar Mehmûd" û hevîna wî "Civîn Ehmed" ji xelkê Gundê "Coqê" - Efrîn, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û asayêşê ve, û piştî ferzkrina sezayê diravî /2000/P.T li ser her yekî ji wan hatin berdan. Û ta niha Hemwelatî "Ehmed Emîn Elxedo/42/sal" ji heman gundî bêsûc bendkirî ye, lê birayê wî "Selam" ji deh rojan ve hatiye berdan, û herdu jî li 19.1.2022an Z hatin girtin.

- Ji dora deh rojan ve, Hemwelatî "Esmet Hesên Birîmo/38/sal" ji xelkê Gundê "Xezîwiyê" - Şêrewa, ji aliyê rêbenda Gundê "Turindê" ve - Derbasgeha Efrînê ya Başûr, û piştî sê rojan jî ev hemwelatî "Xelîl Ehmed Birîmo/36/sal, Deştî Ezîz Birîmo/39/sal, Rodî Rif'et Kêfo/40/sal, Celîl Ehmed Birîmo/35/sal" ji xelkê heman gundî, ji aliyê "Asayêşa Leşkerî - Efrîn" ve, û yê dawiyê berda û yê din jî birin Hepsa "Maratê".

- Li 25.2.2022an Z, Hemwelatî "Civan Yûsêf kurê Mihemed Nûr" ji xelkê Gundê "Ereba" - N.Mabeta, ji aliyê Milîseyên "Lîwa'i Mihemed Elfatêh" ve, ji ber ku wî karên suxreyî yê ku tene ferzkrin red kirin; Hêjaye were bîranîn ku ew berê jî di navêna 3.4.2018an û 25.1.2021an Z de, hate girtin û zorane hate veşartin.

- Li 26.2.2022an Z, herdu hemwelatî "Mihemed Cabo/56/sal, Ebdo Xelîl/47/sal", ji xelkê Gundê "Kaxrê" - N.Mabeta, bi behaneyê ku wan di dema Rêvebiriya Xweser a berê de bi otombîlên xwe xelk dibirin ser şehîdan, û piştî çend rojan ji girtinê berdan.

- Li 26.2.2022an Z, Hemwelatî "Hisên Ebdo Tona/65/sal" ji xelkê Gundê "Hêkiçê" - N.Cindirêsê, ji aliyê asayêşê ve.

Û weha lîstak bi navê şêst kesî -di nav de jî temenmezin- ji xelkê Gundê "Me'imila" - N.Reco (yên ku di navboriya sê heyvên borî de, bi behaneyê hevpişkiya wan di psrêzvaniya şevayî de -ta ku rojeke tenê be jî- di dema R.X a berê de, hatine girtin, û piştî çend rojan ji girtinê û ferzkirina sezayên diravî ta /2000/P.T li ser her yekî ji wan hatine berdan) me bi dest xistin.

**= Qutkirina hin daristanan:**

- Bi beramberkirina wêneyine du daristanên xwezayî yên ku ji aliyê Gogêl Êrs ve hatine girtin (Tîrmeha 2017an Z berî dagîrkirin û qutkirinê, Tebaxa 2020an Z piştî dagîrkirin û qutkirinê), emê bibînin ku rêjeya qutkirina ya yekê (ya ku li Rojavayê Gundê "Remedana" - N.Cindirêse dikeve û rûberiya wê dora /62/hiktaran) dighêje 90%, û ya dudiyê (ya ku li Bakurê Gundê "Dela" - N.Mabeta dikeve û rûberiya wê dora/16/hiktaran) dighêje 35%; Û ji ber ku qutkirin ji dîroka diwem ve û ta niha-bêtirî du sal û nîvan-berdewam e, vêca mirov dibêje ku gerek niha beşê pir ji herdu daristanan hatibe qirkirin.

**= Binpêkirinîne din:**

- Hin çekdaran ji malên herdu hemwelatiyan "Receb Mihemed, Yûsêf Ehmed" ji Gundê "Coqê" - Efrîn, alav û amûr dizîn, herweha çekdarekî ji Milîseyên "Firqit Silêman Şah - El'emşat" jî mekin li Hemwelatî "Xelîl Hacî kurê Mistefê /43/sal" ji heman gundî xist û birîndar kir, bi sedema ku wî daxwaza dîkana xwe ya desteserkirî kiriye.

- Piştî derxistina biryara bidûrxistina "Mihemed Elcasê - Ebû Emşe" ji Navça Şiyê û radestkirina navçê ji Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" re, endamên "El'emşat" dest bi dizîn û belavkirina tevliheviyê kirin, û xelk ditirse ku bi renegekî din û bi şeweyên têvel, binpêkirin pir bibin û rewş pîstir bibe.

Di ber jiyana veşartiyên zorane û girtiyên bêşûc de (yên ku bi tewanên çêkirî tuhmetkirî, û binpêkirin û rûmetdaxistina mirovane gihîştine wan), destlatên Dagîrkeriya Turkiyê berpîrsiyar in. Ji ber ku Istîxbaratên Turkiyê sepeştiya doseya girtinê û hepsên milîseyan û tewanên tê de dibin, bi awakî yekser dikin.

06.03.2022an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

-----  
**Wêne:**

- G. "Naza" û guvêşgeha destserkirî - N.Şera.

- Lîstak bi navên /60/ kesî ji xelkê G."Me'imila" - N.Reco, yên ku di navboriya sê heyvên borî de hatine girtin.

- Daristaneke Rojavayê G. "Remedana" - N.Cindirêse (Tîrmeha 2017an Z berî dagîrkirin û qutkirinê, Tebaxa 2020an Z piştî dagîrkirin û qutkirinê).

- Daristaneke Bakurê G. "Dela" - N.Mabeta (Tîrmeha 2017an Z berî dagîrkirin û qutkirinê, Tebaxa 2020an Z piştî dagîrkirin û qutkirinê).